

**Bîranîna Dr. Nûrî Dêrsimî**

Di sala 1892 an de, li gundê Axzonik, herêma Dêrsimê ji dayîk dibe. Xwendina xwe li Xarpût û Stenbûlê beşê bijîşkê( bêtera) kuta dike û piştî xwendiana xwe kuta dike, dibe rûnştvanê Ezirganê. Di zanîngehê de xebata xwe ya Kurdayetî berdewam



dike, derbasî nav refê komela Hêvî dibe û di komela xwendekarên Kurdistan de jî dixebite.

Di serhildana Dêrsimê – 1937 - de, ya bi seroktiya nemir Seyêd Riza, Dr. N. Dêrsimî dibe şewirdar, bîrewer û aqilmendê serokê serhildana Dêrsimê. Piştî têkçûna serhildana Dêrsimê, Dr. Dêrsimî neçar dibe ku penaberî Sûriyê bibe û dibe rûnştvanê bajarê Helebê.

Dr. N li Heleb, di nav Kurdên Kurdaxê de jiyana xwe derbas dike û têkliyên xwe bi siyasatmedar, Kurdhez, Bedirxanî û Kurdên ku peneberê Sûriyê bûne re domdike û alîkariya doza Kurd dike.

Li bajarê Heleb Dr. N.D du berheman. 1- Kurdistan Tarîxinde- Dêrsim . 2 Hatiratim dinivîse. Lê mixabin herdu pirtûk jî, ji aliyê rijêma Sûriyê ve têne qedexekirin.

Lehengê serhildana Dêrsimê, li bajarê Heleb, di Tebaxa 1973an de, koça dawî dike û li Ziyareta Henên- Kefer-cenê- Kurdaxê ( li gor weseka wî) tê veşartin. Daku bayê Dêrsimê bi ser de were û serê xwe li ser axa ku ji dêrsimê jê re hatiye datîne.

Li ser gora lehengê Dêrsimê weha hatiye nivîsandin :

Dilbirînê bi nalîna welat. Mihemed Nûrî kurê mele Îbrahîm Colik Oglo. Li ser vê rîya dijwar. Min jî kire pir hawar. Da ji bo we rojekê. Dinya bibe gulbuhar.

*Jêder : malpera Avesta*

**Semîh Şiqêr û Strana Li Ser Kurdan**

Semîh Şiqêr stranbêjekî Ereb e, bi stranên xwe yê siyasî, mirovatî û evînî tê naskirin. Dibêjin ku ew komonîst e. Lê, ew dibêje : Ez mirovekî serbixwe me. Di /20/ Avdara 1985 an de, çûye bajarê Hesekê ji bo li şevê helbesê ya hevalê xwe yê Kurd Hesnan Izet beşdar bibe. Li wir bala xwe didiyê ku tevgera bajêr ne normal e. Ez pirsîm çi heye?. Gotin siba Newrozê û birayê xwe Hesnan em ranezan, Ji ber ku di nêrîn û mêjiyê min de, stranbêjê Kurd Şivan perwer weke sembola û hevalekî xwe min didît . Ez û Hesnan Îzet di nivîsandina gotinekê ji bo Newrozê me alîkariya hev kir û me strana xwe bi dawî kir , tevî ta niha min û Şivên hevdu nedîtîye. Di Newrozê de,, heyejaneke pir mezin hate min û hêviya min ew bû ku ez wê stranê diyarî Kurdan bikim.



Lê, sedcar mixabin, komên Folklorî yê Newrozê, rê nedan ku ez wê stranê diyarî wan bikim. Ji ber ez ne girêdayî me bi tu partîyan ve.

Strana Semîh Şiqêr ev e:

**Hevalekî min heye ji Kurdistan**

**Navê wî Şivan e**

**Dengê wî di bale de**

**Wek dema ku di Newrozê de agir li ser çiya vêdikeve**

**Bistire Şivan bêje**

**Bêje û mizgîniya paşerojê bide**

**Xatîra xwe bi cerg**

**Di wê dûraniya wêrek de vêxe**

**Em I hêviyan yek in**

**Me heye yek rêç**

**Ka em bi hev re pêxînin**

**Da ku were**

**Ew kêfa em hemû li hêviyê ne**

**Ew roja ku em wê pîroz bikin**

**Li ser çiyayên bilind**

**Li ser çiyayên bilind**

*Jêder : malpera Avesta*

Amedeka: Hesnê Cumî